



# Bernameya wasîte û veguhastinê

KURMANJI

**Barnameya wasîte û veguhastinê bernameyeka pîşeyî ye û bidestxistina dîplomeya pîşeyî armanca wê ye.**

Bernameya wasîte û veguhastinê ji te re ye ku hez dike di warê wasîte û veguhastinên cuda de yan di warê miamelekariya alavan de kar bike. Tu dê wasîteyên cuda teşxîs bikî, tamîr bikî û sexbêr bikî.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pîşeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînin da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînin.

## PÊNC PISPORIYÊN CUDA

### Miamelekariya alavan

- Tu dê zanyariyan li ser miamelekariya alavan û lojîstîkê werbigirî. Ev pisporî îmkânê dide ku tu wek, bo nimûne, karkerê enbar û termînalên kar bikî.

### Karoserkarî (heykelkarî) û boyaxkirin

- Tu dê zanyariyan li ser boyaxkirina wasîteyan, teşxîskirin û tamîrkirina karoseran (heykelên erebeyan) werbigirî. Ev pisporî îmkânê dide ku tu wek, bo nimûne, tamîrkerê qisûrên otomobîlan yan boyaxkerê otomobîlan kar bikî.

### Kamyon û makîneyên gerok

- Tu dê zanyariyan li ser teşxîskirin, tamîrkirin û sexbêrkirina wasîteyên giran û makîneyên gerok werbigirî. Ev pisporî îmkânê dide ku tu wek, bo nimûne, mekanîstê kamyonan yan mekanîstê makîneyan kar bikî.

### Otomobîla şexsî

- Tu dê zanyariyên li ser teşxîskirin, tamîrkirin û sexbêrkirina wasîteyên sivik werbigirî. Ev pisporî îmkânê dide ku tu wek, bo nimûne, mekanîstê otomobîlên şexsî kar bikî.

### Veguhastin

- Tu dê zanyariyan li ser trafikzanî, sîstema veguhastinê û lojîstîkê werbigirî. Ev pisporî îmkânê dide ku tu wek, bo nimûne, otobusajo yan kamyonajo kar bikî.

### Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser wezîfe û heykelê wasîteyan û ka tu çawa wasîteyan teşxîs dikî, tamîr dikî û sexbêr dikî werbigirî. Tu dê fêr bibî ka mirov çawa alavan yan kesian vediguhêze û li enbar û termînalên miameleya alavan dike. Tu dê fêrî bikaranîna komputeran û sîstemên komputerê yê cuda jî bibî.

Bona mirov xwe ji ziyânên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernameyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

**Bername weha hatiye rêxistin**

Madeyên dersê di bernameyên pîşeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernameyên pîşeyî de, tu dê zêdetir madeyên pîşeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî.

Branşa wasîte û veguhastinê û teknîka wasîteyan madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername-kûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

**Awayên xebatê**

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîfîgirtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyên zêdetir li ser îmkanên birêvebirina şirketeka şexsî werbigirî. Tu dê hîn bibî ku plankirin, pêkanîn, dokumentkirin û kalîteparastin ya karî bikî. Tu dê fêrî bijartina techizat û metodên rast bibî.

**Projeya lîseyê**

Tu dê di dawiya Bernameya wasîte û veguhastinê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

**Fêrbûna li cihê karî**

Hîn beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

**Şagirdîkirin**

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

**Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gorî dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bername-kûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.